

Xizmetên tenduristî ji bo penaxwaz û penaberan li Norwêcê

Penaxwaz û penaberên li Norwêcê xwedî mafên xizmeta tenduristiyê ne ji bo nexweşiyên fizîkî, pirsgirêkên derûnî, problemên bendebûnê, û tedawiya diranî.

Dema hatina li Norwêcê

Piştî ku hûn hatin Norwêcê, hûn ê bibin xwedî maf ji bo wergirtina xizmeta tenduristî ya sereke. Eger hûn nexweş bin an jî ducanî bin, û/an jî pêwîstiya we ya bi dermanan hebe, divê hûn di dema zûtirîn de xizmeta tenduristiyê wergirin. Her wisa hûn e bibin xwedî maf ji bo wergirtina alîkariya tibî ya pisporane eger hûn rastî şer, arîşe, êşkence, tundî, destdirêjî an jî sineta organên mê hatibin, û di encama wan de hîn jî wan pirsgirêkan dijîn.

Muayeneya tuberkulozê

Dema hûn hatin Norwêcê, divê testa we ya tuberkulozê bê pêkanîn. Herkesê ku ji welatekî bi bûyerên zêde yê tuberkulozê tê divê vê testê bibîne. Divê hûn testê di nav du rojan de bibînin û teqez ne piştî 14 rojên li pey hatina we.

Agahiyên bi zimanên din

Êşnasiya tuberkulozê - agahiyên bi 23 zimanan (fhi.no)

VVîdeoyên derbarê êşnasiya tuberkulozê ya bi zimanên cuda (youtube.com)

Derzîkirin

Derzîkirin ji bo zarok û ciwanan

Hemû zarok û mirovên ciwan ên 20 saliyê biçûktir **xwedî maf in ku li hember çend nexweşiyên bî derzîkirin.**

Zarokên ji 2 saliyê biçûktir divê di dema zûtirîn de bî derzîkirin. Zarokên din û ciwan divê di nav 3 mehên hatina xwe ya Norwêcê de bî derzîkirin.

Eger pirsên we yê derbarê derzîkirina zarokê we hebe, hûn dikarin bi hemşîreyekê re biaxivin. Hûn dikarin bi xwe biryarê bidin bê ka hûn dixwazin zarokên we bê derzîkirin.

Derzîkirina mezinan

Eger hûn mirovekî mezin bin ku beriya niha we nexweşiya sorikê û mîrkutokê girtibe, û hûn li dijî wan nexweşiyên nehatibin derzîkirin, divê li dijî sorikê, gurepê û mîrkutokê pêşniyaza derzîkirinê li we bê kirin ne bi derengiya yek salê piştî hatina we. Hûn dikarin bi xwe biryarê bidin bê ka hûn dixwazin pêşniyaza derzîkirinê qebûl bikin.

Eger hûn li dijî falinca zarokan nehatibin derzîkirin, divê ev derzîkirin li we bê pêşniyazkirin di nav 1 sala hatina we ya Norwêcê de. Hûn biryarê didin bê ka hûn dixwazin vê pêşniyaza derzîkirinê qebûl bikin.

Muayeneya tibî ya sê meh piştî hatina we ya Norwêcê

Sê meh piştî hatina we ya Norwêcê ya wek penaxwaz an jî penaber, divê muayeneya tibî ji we re bê pêşniyazkirin. Muayene wek edetî dê ji aliyê hemşîreyekê ve bê pêkanîn.

Eger ji we re zêdetir tedawî pêwîst bike, hevdtîneke bi bijîşk re dê ji bo we bê dayîn. Wergêrek ê ji we re bê terxankirin eger pêwîstiya we pê hebe. Ew xizmet ji bo we wek kesekî nexweş bê pere ye.

Li ku alîkariya tibî wergirin

Xizmeta tenduristiyê ya acîl

Di bûyerên qeza, nexweşiyên giran an jî di rewşên din de ku hûn an jî kesekî din pêwîstî bi xizmeta tedawiyê ya lezgîn bibînin, divê hûn jimareya tibî ya acîl 113ê (ambulans) bigerin.

Alîkariya tibî

Wek penaxwaz an jî penaber, hûn xwedî **maf in ku ji bijîşkê giştî (BG)** re bê hinartin. Ev tê vê wateyê ku hûn dikarin her dem heman bijîşkî bibînin. Divê mafê we yê xwe gihandina bijîşkekî hebe dema pêwîstiya we pê hebe, her çiqas hûn ji BGyekî re hêj nehatibin hinartin jî. Şaredariya we dikare alîkariya we bike da ku hûn BGyekî peyde bikin li cihê ku dijîn.

Hûn dikarin **xizmeta tenduristî ya derûnî wergirin** eger hûn rastî problemên derûnî tî û pêwîstiya we bi alîkariyê hebe. Hûn wek nimûne dikarin alîkariyê wergirin

eger hûn rastî êşkencê, tundiye û destdirêjiyê hatibin, û pêwîstiya we hebe bi yekî re biaxivin derbarê tiştên ku hatine serê we. Eger pirsgirêkên we yên razanê yên giran hebe ev yek dîsa derbasdar e.

Hûn her wisa dikarin alîkariyê wergirin eger hûn xwedî problemên îstismara madeyê bin. Hûn dikarin bi bijîşkekî re an jî pisporên din ên tenduristiyê re biaxivin derbarê tedawiya pêkan a ji bo bendebûnê.

Xizmetên tibî yên derveyî-saetên-xebatê

Eger hûn an jî kesekî din ê malbata we dema êvarê an jî dawiya heftê nexweş bikeve û hûn nekarin biçin ba bijîşkekî din, hûn dikarin têkilî bi **xizmeta tibî ya derveyî-saetên-xebatê** wergirin ("legevakt" bi Norwêcî). Jimareya ji bo xizmeta tibî ya derveyî-saetên-xebatê 116 117 ye.

Xeqê pereyî ji bo xizmeta tenduristî ya mezinan

Wek mirovekî mezin, divê hûn heqê pereyî yê bikarînerê xizmeta tibî ya derveyî-saetên-xebatê û yê li ba bijîşk bidin. Hûn mecbûr nînin ku heqê pereyî bidin ji bo qebûlkirina bo nexweşxaneyê.

Hûn xwedî mafê xizmeta tenduristî ya bêpere ne eger di we de **yek ji wan nexweşiyên bienfeksiyon peyde dibe** (PDF, bi Norwêcî). Eger ji wan nexweşiyên yek di we de hebe, di hin rewşan de hûn dibin xwedî maf da ku li Norwêcê bimînin ta ku hûn tedawiya xwe xilas bikin.

Kondom bêpere ne û divê li navendên hatinê û li avahiyên pêşwaziyê peyde bibin. Jinên temenê wan navbera 16 û 22 xwedî mafê alîkariya aborî ne ji bo piştgiriya bi cureyên din ên kontrola zarokanînê.

Xizmeta tenduristî ya bêpere ji bo jinên ducanî

Jinên ducanî xwedî mafê sereke yê xizmeta tenduristî ne beriya, dema û piştî zarokanînê. Jinên ducanî xwedî maf in ku ji aliyê bijîşk an jî ebeyê bîn şopandin, û her wisa mafê wan yê zarokanînê yê li nexweşxaneyê heye. Jinên ducanî dikarin biryara xwe bi xwe bidin bê ka heya hefteya 12ê ya hemlebûna xwe zarokê ji ber bibin an na.

Ji bo jinên ducanî, hemû xizmetên tenduristî heya zarokanînê bêpere ye. Her wisa zarokanîna li nexweşxaneyê jî bêpere ye.

Peredayîna ji bo tedawiya diranî

Wek mirovekî mezin, hûn ê wek edetî heqê tedawiya xwe ya diranî bidin. Eger hûn li navendeke hatinê an jî avahiya pêşwaziyê dijîn, hûn dikarin heqê lêçûna tedawiya acîl ya diranî daxwaz bikin.

Xizmeta tenduristî ya bêpere ji bo zarokên jêr 16 salî

Hemû zarokên jêr 18 salî bi timamî xwedî mafê xizmeta tenduristiyê ne.

Zarokên jêr 16 salî mecbûr nînin heqê pereyî bidin ji bo serlêdana bijîşk, psîkolog an jî psîkoterapîst, ji bo wergirtina tedawiyê li nexweşxaneyê, an jî ji bo kişandina filmên X-ray.

Navendên tenduristiyê yê zarokan û ciwanan û xizmeta tenduristiyê ya dibistanê bêpere ne. Hemû zarok xwedî mafê muayeneya tebî û derzîkirinê ne li navendên zarok û ciwanan û li xizmeta tenduristiyê ya dibistanê.

Ji bo zarokan, hemû tedawiyên diranî, ji bilî tîlên diranan, heya ku ew bibin 18 salî bêpere ne. Xizmeta giştî ya diranî dikare ji we re bibêje ka kîjan bijîşkê diran bêpere zarokan muayene dike.

Mafên we yê tîkildarî xizmetên tenduristiyê

Pisporên xizmeta tenduristiyê xwedî peywîra veşartîbûnê ne

Hemû pisporên tenduristiyê berpirsiyar in ji bo **peywîra veşartîbûnê** ya derbarê we û tenduristiya we. Hin rewşên awarte hene ji bo vê yekê, eger qebûlkirina we ya parvekirina agahiyên tenduristiyê hebe ew jî tê de, eger ji we re bo dabînkirina xizmeteke tenduristiyê ya rêkûpêk pêwîst bike, an jî eger jiyana we yan jî jiyana yê din di xeterê de be.

Qeydên nexweşan

Mafê we heye ku hûn qeydên xwe yê nexweşiyê bibînin ("Pasiëntjournal" bi Norwêcî). Eger hûn PBê xwe biguherînin, hûn dikarin bixwazin ku ew qeyd ji bijîşkê we yê nû re bê şandin, eger hûn dil bikin.

Agahiyên bi zimanê ku hûn pê dizanin

Mafê we heye ku hûn agahiyên derbarê tenduristiya xwe û xizmetên tenduristiyê yê ku hûn werdigirin bistinin. Ew agahî ji we re pêwîst dike da ku hûn razîbûna xwe bidin xizmeta tenduristiyê. Agahî divê bi zimanekî ku hûn pê dizanin bê dabînkirin.

Bijîşk an jî hemşîre dê wergêrekî eyar bike eger ew pêwîst bike. Wergêr ê xwedî peywîra veşartîbûnê be. Xizmeta wergandinê ji bo we wek nexweşek bêpere ye, ji bilî xizmeta tenduristî ya diranî.

Mafê we yê îtirazê heye

Eger hûn di vê baweriyê de ne ku hûn xizmeta tenduristiyê ya ku mafê we ye wernagirin, hûn dikarin gilûgazinê bişînin xizmeta eleqedar. **Ombudsmanê Xizmetên Tenduristî û Civakî** yê li navçeya we dê bikare têkildarî îtiraza we ji we re bibe alîkar.

Peywîra veşartîbûnê

Xebatkarên tenduristiyê xwedî destûr nînin ku agahiyên tibî yên derbarê we bêyî razîbûna we radestî kesên din bikin, bêyî ku qanûn wê derfetê bide wan.

Mafê we yê bo wergêr

Nexweşên ku bi awayekî herikbar Norwêcî nizanin xwedî mafê wergêr in.

Xizmeta tenduristiyê ya ji bo mirovên ku redkirina dawî ya serlêdana penaxwaziyê wergirtine

Her çiqas we redkirina dawî ya serlêdana penaxwaziyê wergirtibe jî, hûn hîn jî xwedî maf in ku tedawiya li nexweşxaneyê wergirin, alîkariya tibî ya lezgîn û xizmetên tenduristî yên sereke yên acîl wergirin. Eger hûn ji hêla derûnî ve ser hemdê xwe nebin, dibe ku hûn mafê tedawiyê ya li xizmeta tenduristiya derûnî wergirin.

Zarokên ku mayîna wan a fermî li Norwêcê tune xwedî maf in ku ji bijîşk an jî nexweşxaneyê xizmeta tenduristî wergirin, lê nikarin ji BGYekî re bîn şandin.

Eger we redkirineke dawî standibe, dê pêwîst bike hûn heqê pereyî yê xizmeta tenduristî ya ji bijîşk û tedawiya nexweşxaneyê bidin, lê heta ku hûn xizmeta tenduristî nebînin hûn mecbûr nînin ku heqê wê pêşde bidin. Eger hûn piştî nekarin heqê lêçûnan bidin, xizmeta tenduristiyê dê heqê lêçûnên we bide.

Wek jineke ducanî ya ku redkirina dawî standiye, hûn xwedî maf in ku xizmeta tenduristiyê beriya, dema û piştî zarokanî wergirin, li nexweşxaneyê zarokê bînin û zaroklibergirtinê pêk bînin, bi qasî dema ku hûn li Norwêcê bin. Lêçûnên

zarokanînê divê hûn bi xwe bidin eger hûn bikarin. Eger hûn nekarin heqê wê yê pereyî bidin, xizmeta tenduristiyê dê heqê lêçûnan bide.

Xizmeta tenduristiyê ya ji bo kesên ku mayîna wan a fermî li Norwêcê tune

Herkesê ku li Norwêcê dijî xwedî maf e ku alîkariya demildest û xizmeta tenduristiyê wergire ku tişteke yekser pêwîst e û nabe ku gîro bibe.